

## Helîm Yusiv û Tirsê bê Didan

### Nirxandin

Babetê Tirsê di têkstên wêjeyî de ne karekî hêsan e, welê ev nayê wê ramanê ku divê mirov ango nivîser xwe têkel neke, berûvajî vê yekê, nivîserên wêrek û şahreza xwe taloqî van babetên weha hestiyar dikin. Ger nivîser bixwaze xwe têkelî babetê tirsê bike, divê bi nihêrînekî şahreza ya kûr li vî babetî binihêre, û şahrezayîyeke baş li ser hebe û cureyên tirsê ji hev cêwaz bike. Tirs babetek derûniye, dibe egera peydabûna nexoşiyên derûnûceste yî ”*psychosomatic*”, bi naxê insên ve girêda ye, lewma divê nivîser diyardeyên wê bizane ku çi ne, bi çavek zanistî li vî babetî binihêre ji ber ku mirov nikane tirsê bi ruwangeyeke wêjeyî ji tirsê bi nihêrîneke zanistî cuda bike, eger nivîserek vê bike, hîngê wê bibe peydabûna ne hemahengiyê di têkstê de û wê deqê wê ji rastiye dîr bikeve.

Bi dîtinek rewannasî, tirs ”*anxiety*”, bêguman ji xofê ”*fear*”, cêwaz e. Tirs û Xof, ev herdu faktor li cem insên xûya dibin welê li cem giyandaran tenha ”xof” heye, ji ber ku giyandaran û postanan tirs nîne, tenha xof li cem heye. Demê giyandarek weke xezalekê bû mînak şêrekê dibîne ew di xofê lê na tirsê çûnku tirs weke me got li cem jîndarên ne hoşdar nîne, tirsê wan bi diyardeya xofê ye û diyardeyên wê yê fysiologî cuda ne. Bû mînak, li cem xifê çav bloq dibin, vîvilîk fireh dibin, dil dijene, diqute, guh piçekê giran dibin, sîng diêşe, nefes teng dibe, xûhdan laşî digire, dilerize û htd. Lê li cem tirsê diyardeyên wê cuda ne, ku em dê li jêr behs bikin. Evca tirs hîngê li cem insên peyda dibe sedemê tişteki ne eşkere û ne diyar di hizirên wî de diafere, bû mînak; belku dilê zengînekê herdem bi tirsê be ji ber kirîzekî aborî, ango herdem tirs di dilê wî de heye ku gencîneya xwe ji dest bide, welê eger pilingekê bibîne wê hîngê symptomên xofê li cem peyda bibin, ji ber hindê gelek insan toşî nexoşiyên mîna Panîk û Fobiyar dibin. Yan jî eger yekê kareke xerab weke tawanbariyekê, yan dijatiyeke ramiyarî, yan hevpeywendiyek bi ciheke ne pesendkirî ve hebe, helbet herdem tirs di dilî heye ku dibe asayiş li dûv bigere û bigirin û bi dehan mînakên weha. Eger kesek di hinek epîsodên tirsînak yê traumatîk ra derbaz bûbe, di pişt ra ew tirs pêş<sup>1</sup> dikeve, guherîn dikevê, dibe nexoşiya posîdegî ”*depression*”, û li cem hinek kesan jî tirs û xomokî

têkel e û dibe "Manîo-Depression", ango Şêto-Xemokî. Ger pitir vekêşa û nehat çarekirin wê nexoşiya Post Traumatic serê xwe vêra hilde û ew jî wê lê zêde bibe. Ger kesek di zarokatiya xwe de di tiresekê ra bûrî be yan li rast giyandarekî durrindeh hatibe yan jiyana xwe di jîngehekî dijwar ya pir bi girtin û kuştin ra derbaz kiribe, hîngê wê toşî nexoşiyên mîna "Fobî, fobos, φόβος, Tirs" û PTSD bibe.

Di vê dawiyê de min romana berêz Helîm Yusif "Tirsa bê Didan", di malpera YNK Duhok bi pîtên Farisî xwend. Li vir, ger bi kurtî jî be û herçende rexne di nêv me de tehle jî, welê dixwazim dîtinekê berdim ser naveroka vê romanê. Bêguman nivîserî heta radeyekê tirs wek fakterekî nêvnax daye xûya kirin. Di nêv hinek rêzan de dibêje "*kes nizane tirs kengî peyda bûye*". Da baştir be, ger ev hevok di têkstê de ne hatiba nivêsin. Tiştê ku xûdan jê ne piştrast be û gumanî têde hebe baştire xwe jê bide paş heta ne hemahengî nekeve di rêzên babetî de. Ev rast e, kes nizane tirs li kîjan demjimêrê û di kîjan gavê de hetiyê hebûnê, ji ber ku bi naxê insên ve hevbend e û insan bi hezarihan salan kevin e. Bêguman peydabûna hoşdariyê li cem insên ne di gavekê û kêlîkekê de bi nişkivînî hetiyê aferandin, belku bi hezarihan salan dem kişandiye, bi şêweyê pêşveçûyî î guherînek "*Evolution*" bi demî ra pêşketiyê, heta insan gehiştîye vî astê ku î roj têde dijî weke "*Homo Sapiens*". Welê qet guman têde nîne ku tirs bi hebûna insên ve girêdaye. Helbet demê wê nayê zanîn, welê gava mirov peyda bû hîngê wê jî mîna hoşî xwe havête nava şane û xûna insên û pêve hatiye çespendin, bi saya wan substansên weke *Amygdala di Lymbik system* de di moxê insên de, ku kevintirîn parçeyên demaxê insênin û bi Girîkî jêra dibêjin *Paleocortex û Archeocortex*. Paleo û Archeo=kevnar, Cortex=çeçên demaxî, weke *Neuron û Dendrît* 'an.

Danerê bingehên teoriyên psykoanalîsê "*Abriss der Psychoanalyse*", Sigmund Freud dibêje; ji aliyekê ve tirs positive, anku erêniye, ji ber ku insên xwe ji jîngehên kujek û xeternak diparêze, ew jî çekê yê xwe parastinê ye û bi saya vî çekî insan hatiye parastin heta roja îroyîn.

Ev roman bi şêweyêk realîstîk, têkel bi fantazîzmê û helbet bi girêdaneke nêvnaxî ya psychoanalîtîk li ser naxê karakterê romanê Mûsayê Qmîşlokî ve hevbeste. Di deqî de dibêje; "*Ez nikanim bibim çavê her kesê, ji ber ku tenê<sup>2</sup> ez çavê Mûsayê Qamilokî me (L.5)*".

Bi dîtina min, da pir ciwantir be eger ev hevoke ne hatiba nivêsin. Divê di têkstên litteraturî de, nivîser xwe neke parêzer û advokatê çî kesê. Diviya bi şêweyê wêjeyî(objectiv), û bi nivêsiyê kûr di rêzan de darêhtiba û jiyana Mûsayî ya sipate û bi tirs di deqê de vegotiba û vekola ba. Pitir di naxê wî de çûba xwarê ji bêyî, ku peyva "Ez" vebêje, ji ber ku ev formê nivêsiyê wekî nivêsiyê raportekê yan projêktekî akadêmî ye. Helbet şêwazê nivêsiyê akadêmîk ji ya litteraturê cêwaze. Di nivêsinên akadêmî de, li ser naveroka têkstê divê nivîser herdem jêderan bide diyar kirin, li dawiyê konklusionê, rêsûmê jê derbike, raman û dîtînên xwe derbike û hemahengiyekê di navbera babetên têkstê de bi aferîne. Welê di litteraturê de, ji ber ku nivîser bi xwe aferîner e, ev yek ne pêwîste, ku bû mînak bêje; *"Ezê ji bêdengiyê dest pê bikim. Tirsê bê Didan.L.5"*.

Her weha peyva "Tirs" di deqê de gelek hatiye dubare kirin, di romanê hemiyê de û bi taybetî li hin deran mirov ji peyva tirs qurtal nabe, belku her du rêzan peyveke "Tirs" têda hatiye nivêsin. Ji laperê 45-46, bi tenê 12-13 caran peyva tirs hatiye dubarekirin, ev jî helbet deqê rezîl dike. Ev yek ne pêwîst bû, ji ber ku divê nivîserî bi karakteran, bi karî, reftarê, rewîştê ev babet dabaye nasandin ji bêyî ku wê peyvê weha têr û tijî bi nav bike û pîrbare bike. Ji aliyekî din ve, têkst hinek bêzare û gelek di babetên jîngehî yê wî bajarî, kîşewrî û xelkê wê deverê de Ne çûye. Da gelek baştir be, eger nivîserî ji bilî babetê tirsê li ser babetên din jî bi awayê wêjeyî kûrtir axiftiba, yê mîna civak, reftar, tîtal, aborî, cografi, topografi, mênalîtêt, peywendiyên kesayetî, civakî, malbatî, zayendî û htd. Ev taybetmendiyên han ji xwêneran ra daban nasandin, kiriban kevalek, bi şêweyê berfirehtir raxistiba û daban pêş çavan.

Ji aliyekî din ve, roman bi kesayetiyekî tirsokê, karakterek ne mêre. Helbet divê em têbigihin ku, kaûdanên wê deverê weha ne, welê da gelek baştir be, ku Mûsa mirovekî xwepîşandêr jî ba, xweragir ba, kasayetiyekî avaker ba û kênceke karîger li ser jîngeha xwe ya civakî heba. Ji ber ku, insan weke aferînişekî hoşdar, hindî pitir bikeve dibin fişaran de, pitir "Reaction" redê û rikberiyê nîşan dide. Di laperê 24'an de, Mûsa weke mişkekê hest bi xwe dike. Mişk lawaze, lê di heman dem de giyandarekî zekî ye, zîreke, gelek zû xwe di jîngehan de diçespîne û xwe diguherîne. Li wir<sup>3</sup> Mûsa zelamên bêhnok yê sîxor weke pişkan-kitikan dibîne. Bêguman ev lawaziya derûnî ya

Mûsayî dide xûya kirin. Eger Mûsa ji zêdebarî wan tirsan û fobiyan hinek wêrek jî ba da têkstê xurttir bike.

Li hin deran jî, deqê romanê, bû mînak ji (L.19-27) bi şêweyeke ne aktîv e, belê passîv e. Li hinek deran jî gelek maye bi "fantasizmê" ve, weke "Saykis û Pîko- Inglîz û Frens" û wan sûcdar dike ku welatê Kurdistan parçe bûye. Ev yek bi dîtinekî Filosofî, *Ecology*, Realîstik, Fîlo û Ontogenetîk ne duriste. Li gor dîtînen zanayê mezin yê Brîtanî, Charls Darwîn, "*The Origin of the Species*", organism ji Emîbayê bigire heta bigehe insên xwe di jîngehê de diçespîne "*adaptation*" û cihê xwe di aferîne, "*The Ecological Niche*". Ne guneha Pîko bû yan jî yeke din bûye ku em weha parçe bûne, nê em ji berî hatina wan bi sedan salan li wê deverê bûn, ma li ser demê Çaldêranê, Sayikîs û Pîko li wir bûn?. Belku ev vedigere ser nax, mênalîtêt, nezanîn, paşverotî, netêgehiştin, xwenasnekirin, nexwendevanî û kêmbûna hestê neteweyî yê me Kurdistan bi xwe. Hizirmendê mezin Ehmedê Xanî vê rastiye di Mem û Zînê de baş dide xûya kirin. Em bi xwe dijminên xwe bûne, ango em bi xwe ne di amadebûn ku hebûna xwe bi parêzin û xwe bi ser xelkekî di bêxin û xwe îsbat bikin ku em jî weke her kesê miletin û divê em xaka xwe biparêzin. Ne guneha Pîko bûye, ku Kurd bibin tajjyên siwarên Hemîdî yên xelkê, yan mîr Şêr Êzdîn xwe radestî dijminê xwe bike, şoreşa xwe biroxiîne, yan Mîrê kore li catê ku kurdistanê bi parêze hêrişan bibe ser Kurdên Êzidî, qir bike, mîrgeha Behdînan bi qelîne, xwe bike fakterê têkbirin, nehêlana netewa xwe, û destê dijminan bigehîne nava cerg û dilên Kurdistan. Ev tê wê ramanê, ku em bixwe ne miletek kêrhatî bûne, welê ez dizanim ku ev rastiyekekî gelek Tehle, welê heta mirov rastiya dîroka xwe nas neke xwe jî nas nake. Evca bi dîtina min li catê, ku gelek bi Pîko û yên din ve maye mijûl, da baştir be eger bi hokar û fakterên zanistî, civakî, cografî, herêmî, netewî, aborî, ohlî, hozekî, malbatî, derebegî û derûnî ve hatiba girêdan.

*"Eger rojekê kesek ji we li tirsê rast hat, jê bi pirsin bê li ku ji dayik bûye?. Wê ji we ra bêje ku: li wê çargoşeya di nêvbera Suriya, Tirkî û Iraq û Îranê de. Tirsê Bê Didan L.29"*

Eger em bi dîtinekî rexneyî van peyvan vegivêşin û binirxînin em dê bibînin ku laxerî û lawaziyekî derûnî di vê têkstê de heye. Da baştir be eger ev hevokê di deqê romanê de ne hatiban vegotin. Eger nivîser xwestibaye tirsê li wir bide<sup>4</sup> xûya kirin, diviya ne bi şêweyeke rastewxo ango dîrekt hema bi çend peyvan bide xûya kirin,

diviya ba bi awayeke filosofî, zanistî, edebî, litterarî î tox, û pir kûrttir û bi argumêntan dabeye nivîsandin. Diviya ba ew babet helbet di têkstê de li wir weke komplêksa wan toxûban daba nivîsandin, ku bi hêsanî ne hatiba fêhmkirin, diviya ji bû goftûgoyê û vesengandina romanê bihêla ba cihê gengeşê. Bila ne weke gelek helbestvanên me têksta xwe bike xwarinekî xweş û ji xwendevanî ra dane ser maseyê û ji bêyî ku xwendevan cihê niqaşê, xirecirê û gengeşê têde bibînin. Weke din jî eger em bi ruwangeyeke zanistî, nexişnîgarî û ramiyarî li wan peyvan binihêrin em dê bibînin, ku hevdiyatîyek ya di nav têkstê û realîteya wê deverê de heyî. Li vir hinek paradoks dikeve naveroka têkstê û rastiya insanê Kurd.

Ji aliyekî din ve, nivîserî symptom anku diyardeyên trisê yên mîna nexwarin, devzubahûn, xûhdan, gêjbûn, hilavêtin, serêşan, piştêşan, sîngêşan, paşvekêşan ji civakê "asociality", bilindbûna fişara xûnê, dengbihîstin "hallucination", ne nivistin, dîtina xewnên tirsinak (Kabûs) di xewê de, tirs ji destxwederketinê, xof ji mirinê, tirs ji dînbûnê, tirs ji windakirina hoşî, lawaziyên cesedî, neşiyane zayendî "impotens", demarreqbûn, çavtarîbûn û htd, li cem karakterê romanê ne dane xûya kirin, welê tenha peyva "Tirs" bi awayeke pîrbare hatiye vegotin. Diviya ba tirs weke diyardeyeke fysioloji li cem Mûsayê Qamişlokî hatiba nîşandan, diyar kirin û hinek ji van symtomên li serî hatûn gotin li cem daban xûya kirin ji bêyî, ku hema tenha hevoka tirs vebêje û dubare bike.

Weke din têkstê ne daye xûya kirin ku hevpewendiyên jîngeha civakî "Social Context", ya karakterê sereke çawaye û bi şeweyeke kûr î tîr di nêv de ne çûye. Em dizanin ku civaka me civakekî bi hev ra girêdaye, yekgirtiye û navoka xêzanê rolekî giring wê heyî ji bû girtin û dana gelek briyaran. Mixabin nivîserî bi awayeke tîr û tijî ev babetên han ne dane diyar kirin, wekî valahiyekê têde xûya dike. Xûya ye ku lez kiriye, diviya pitir li ser kar kiriba û pitir deqê romanê bi nax, aborî, civak, ohl, nexişnîgarî û babetên curecur ve hetiba vebestin.

"Ez di kêlîkeke weha bi sehim de, di malzarokê de çêbûme, sîh sal bi tirseka sêşax ra derbaz bûn (Xwedê, Muxabirat û Serok). Tirsê bê Didan. L.61".

Madem sîh sal bi tirsê ra derbaz kirine, gelo çima hinek diyardeyên fîzîkî, yan<sup>5</sup> psychosomatîk weke yên li jor hatûn navbirin li cem ne hatine nîşan dan?. Ji bilî Telîsoyî, belku tenha

carekê wê çûyî cem pizîşkî û heta navê wî pizîşkî jî ne hatiye gotin. Qet rojekê jî dermanek yan hebek bû mînak weke (*Truxal*) li dijî tirsê ne wergirtiye û ne xwariye. Weke din jî, eger em bi çaveke zanistî li vê risteyê mêze bikin, ku di malzarokê de tirsiyaye, pa çawan heta niha piştî temenê sîh salan nexoşeyeke weha derûnî û ku di reftarên wî de bihêtin dîtin peyda nebûye?. Mûsa weke karakter, bi awayeke aqilane di têkstê de reftaran dike, weke miroveke ji aliyê fîzîkî ve saxleme û ji aliyê derûnî ve hoşê wî temame û tenha ditirse. Li gor zanistê, pêşveçûn û peydabûnên nexoşiyên derûnî, eger jinek bi zik (*Avis*) bikeve di kaûdanek gelek tirsinak de, hîngê dibe egera peydabûna guherînên cesedî, fysiologî, tirs kêncê xwe li şanayan dike, hormonên ku bi tirsê daxbar dibin vediguhezî cem zarokî jî di malzarokê de û ew Gînên bi tirsê kêncbar bûne weha digehin bêçî û piştî ji dayikbûnê jî zarokê wê piştî 17-20 salan jî bi ihtîmalekê toşî nexoşiyekî derûnî bibe û dîn bibe. Li gor vê risteya jorîn ya têkstê, diviya Mûsa hinek gêl, sefil, pelîd, dîn û şêtoke ba. Raste ev tiştên me gotî zanistîne, welê mirov nikane çavên xwe li zanistê bigire, ji ber ku di vî gerdûnî de hemî tişt bi hev ra hevpeywendin û ji hev nahên veqetandin û ew jî beşeke ji litteraturê. Bû mînak, eger nexoşiya karakterekê tenha tirs be, mirov nikane di romanê de bêje; ew hest dike ku bûye çar kes”*depersonalization*”. Ji ber ku ev sypmtom li cem kesên toşî nexoşiya Schizofirênî dibin peyda dibe.

Ji aliyekî din ve, zimanê têkstê ne zimanekî wêjeyî î zengîne, belê serdeve. Di deqên litteraturî de, divê nivîser bizavê bike ku zimanê xwe yê petî di nivîsê de xurt bike û bide zanîn ku şiyânên wî yên zimên hene û li zarê xwe şahrezaye. Gelek caran ji bû nivîserê Kurd giringe, ku paşde vegere zimanê xwe yê kevînar û heta gelek caran peyvên kevînar ji zimanê Medan, Pehlewî, Zazakî, Lorî û Farisî jî bigire û dîsan vejîne. Ji ber ku kes nikane van zimanan ji hev cêwaz bike, bingehên hemîyan yekî û ji yek xêzanê ne. Farisan gelek sud ji kultur, ziman û dûroka Medan wergirtiye û niha kiriye malê xwe. Ê...çima em lê nevegerin û malê xwe dîsan vezivirînin?.

Di soxîn, destxoşiyê li nivîserê hêja H.Yusiv dikim ji bû vî karî û zengînkirina pertûkxana Kurdî. Helbet min hewildaye ku xwe ji kaşoyê daholqutanê dîr bixim, berûvajî, min dixwest bi çavekî wijdanî li vê nivîsê mêze bikim û layenên wê yên neyênî xûya bikim. Babetê vê romanê gelek giringe, babetekî<sup>6</sup> hestiyare û nivîserî hewil daye ku rastî ya serdest û jêrdestên wê deverê yên di bin bandorên siyaseta

nehêlan, eşkence, dûvçûn, berzekirin û pakkirina regezî de diyar bike.



Kovan Sindî  
Aarhus. 06.Sibat.2009.  
E-Mail: kovan-s@hotmail.com